

# Agahdarî li ser lêdana vaksîna koronavîrûsê: Erênî & Neyînî

<b>Sedemên baş jibo vaksînlêdanê</b>	<b>Çi guman hene?</b>
<p><b><u>Vaksînlêdan min ji qonaxa giran an kujer a nexweşiyê diparêze</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Bi taybetî di pêla sêyemîn de, gelek ciwan jî hebûn ku pêşveçûnek giran û bandorên demdirêj nîşan dan. Hin ji wan dibe ku çend mehan berdewam bikin.</li><li>• Heya 6-ê Tîrmeha 2021-an, li Almanyaya 91,068 kes ji destpêka pandemiyê ve bi Kovîd-19 mirine.</li></ul> <p><b><u>Vaksînlêdan malbata min û tevna min a civakî diparêze</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Ji ber ku demek înkubasyonê bi nisbet dirêj e, vîrus pir caran bêyî ku were sehkirin dikare belav bibe. Lêbelê, mirovên vaksînkirî dikarin zincîrên tûşbûnê bişkinin.</li></ul> <p><b><u>Bi vaksînlêdanê ez berpîrsiyariya civakî diqirim ser milê xwe</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Mirovên vaksînkirî, yên ku nekarin xwe vaksîn bikin jî diparêze. Di nav van kesan de, ji bo nimûne, pitik, mirovên xwedan pergalek parastinê ya qels an nexweşên bi rîsk bilind hene.</li></ul> <p><b><u>Vakslêdan barê pergala tenduristî û yekîneyên lênihîna giran sivik dike</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Her ku mirovên bêtir vaksîn dibin, kesên kêmtir ji ber nexweşiyek giran hewceyê dermankirin li nexweşxaneyê ne. Kêmkirina barê nexweşxaneyan dê bi kêrî hemû nexweşan were - di nav wan de kesên ku ji bo nexweşiyên din hewceyê dermankirina bijîjkî ne.</li></ul> <p><b><u>Vaksînlêdan bi ewlehî diparêze</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Li gorî lêkolînên vaksînlêdanê, vaksînen ku hatine pejirandin xwedî bandorek pir zêde ne piştî ku laş li pey vaksînlêdanê têra xwe antîbodî/antîkor çêkir.</li></ul> <p><b><u>Vaksînlêdan alîkariya me dike ku em vegerin jiyana normal.</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Her kes dixwaze vegere jiyana normal, civakbûn û rehetî. Her kes bi şikandina zincîrêntûşbûnê û sekinandina belavbûna korona alîkariyê dike.</li></ul> <p><b><u>Vaksînlêdan şansê me ye ku em dawî li pandemiyê binin</u></b></p> <p>Ger hejmarek kafî ji mirovan vaksîn bibin an eger ew ji ber tûşbûnek berê xwedan antîbodî/antîkor bin, ji vê re tê gotin parastîbûna keriyê. Di demek dirêj de, ev ê pêşî li belavbûna berfireh a nexweşiyê bigire û ji bo kontrolkirina pandemîkê bibe alîkar.</p>	<p><b><u>Ma vaksîn ewledar in?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Di rêbaza pejirandina Ewropî de standardên kalîteyê ji bo vaksînan pir bilind in. <b>Tehmûlbûn, ewlehî û bandora</b> derziyan di sê qonaxên lêkolînê de hatin ceribandin.</li></ul> <p><b><u>Çima vaksîn zû zû hatin pejirandin?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Ji ber ku vaksînlêdan ewlewiyetek sereke bû, gelek astengî, wekî astengiyên burokrasî û pîrsgirêkên darayî hatin rakirin. <b>GIRING:</b> Lê, vaksînen pejirandî wekî vaksînen nexweşiyên din ceribandînen djwar derbas kirine.</li></ul> <p><b><u>Ma bandorên nehsên vaksînê hene?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Wekî her vaksînlêdanê, piştî lêdana vaksîna KOVÎD-19, bertek û bandorên nehsên vaksînê dikarin bibin. Bertekên vaksînê bi gelemperî demek kurt piştî vaksînlêdanê çêdibin û çend rojan dom dikin.</li><li>• Pir caran, bertekên vaksînê tune an jî tenê bertekên wê yên piçûk hene. Wekî nimûne, bertekên vaksînê êşa li cihê derzîlêdanê, westîna an serêşe ne.</li><li>• Heya 31-ê Gulana 2021-an, bertekên cidî yên vaksînlêdanê tenê di 0,2 ji 1000 dozên vaksînê hatin ragihandi ji Enstîtuya Paul Ehrlichê re.</li></ul> <p><b><u>Ma têbîniyeka bijîşkî heye?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Berî derzîlêdanê, divê hûn her dem formeka dîroka bijîşkî tijî bikin û herwisa hûn dikarin bi bijîjkek bişêwirin.</li></ul> <p><b><u>Dermane perpune béberdan dike?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Na.</li></ul> <p><b><u>Dermane perpune mirat guherî dike?</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Na.</li></ul>
<p><b><u>Agahiyên zêdetir</u></b></p> <ul style="list-style-type: none"><li>• Li Navçeya Kleve (<a href="https://www.kreis-kleve.de/">https://www.kreis-kleve.de/</a> ).</li><li>• Wezareta Kar, Tenduristî û Karûbarên Civakî li NRW (<a href="https://www.mags.nrw/">https://www.mags.nrw/</a> )</li></ul>	<ul style="list-style-type: none"><li>• Wezareta Tenduristiyê ya Federal: Bi hev re li dijî korona (<a href="https://www.zusammengegencorona.de/">https://www.zusammengegencorona.de/</a> )</li><li>• Enstîtuya Robert Koch (<a href="https://www.rki.de/DE/Home/homepage_node.html">https://www.rki.de/DE/Home/homepage_node.html</a>)</li></ul>